MALBATEKA KURD LI HOLENDA PARÊZERIN

amadekirn û berhefkirn Behzad Amêdî

Evro me bi fer zanî ku vê çavpêkeftinê digel keçeka kurd bikim ku şiyaye pileka bilind bi dest xwe bînit li welatekê biyanî..lê ez pitir sersumayî mam demê min zanî ku nebes ew xwedî pileka bilinde, belko hemû xelkê mala wê xwedan bawernamên (diplomayên) bilindin. Bêgoman palderek yê hey ku ew paldabine vê rêbazê û xuya bû deyk û babên wan bûyne ji bû wan, çunkî ew xwediyên hesteka net-eweya zor bilindin pêdivye ew kar bikin bo miletê xwe, û dayka vê xêzanê diviya bi vî hestê bilind ve daxwazyekê ji dayk û babên kurd bikit di bêje:(ez wek daykekê li ewropa dijîm digel zarokên xwe, hîvîdarim ku hûn hemû bibine harîkar bo zarokan û hewil bidin bibine palder û nebin asteng ji bo pêşkefitina wan, ji bîr nekin ku hestê netweyî li nik wan bilind bikin, her wekî mezina gotî eger gul nebî dirgîş mebe, çunkî paldana we bo zaroya û taybet bo keça, dê baweryekê li nik wan dirust kit daku bibine xwedî helgirê alayê paşe rojeka geş bo miletî û bo xwe jî. mebesta min ewe eger ew serbexwe bin di hizro bîrên xwe da, dê milet jî bi wan serbexwe bit, bê goman hûn mînaka wa-nin û hîvîdarim bimînin mînak û supas). Demê min ev çende guhlê bûy, bo min palderekê dî çê bû ku min hez kir zotirîn dem ez digel vê keçê bipeyvim ku keça vê kesa xwadan hesta neteweya bilind e, ka ewê çi heye, çi asteng û arêşe û çewa rêça xwe dîtîiye? ew jî Maşela Demîrtaş e.

(Maşela Demîrtaş) xelka Mîdyadê ye li devera Mardînê ku dikeve bakorê kurdistanê, li sala 1974 li Holenda li bajêrê Arnhêm hatîye dinê. nuhe jî her li vî bajêrî dimîe, xwandana xweya seretayî, navincî û ya amedeyî jî her li vir dumahî anye û xwandina kulîca yasay li zankuya (naym'exin) dûmahî anye, nuhe helgira bawernama (diploma) parêzeriye li beşê (tawanbara).

*** her li destpêkê te hez dikir bibiye parêzer?**

Tiştê her yê diyar ewe min diviya li destpêkê bibime noşdar ku da bişêm xelkê jar çareser bikim, daku subehî destê harîkariyê bi hizareha kurda ra dirêj bikim.

*** Maşela noşdar, çewa bû Maşela parêzer, me divêt vê bizanîn?**

Raste gelek ya jêk dûre wek nav, lê herdu bo harîkariya xelkê bê desthelat û jare, , min 2 sala babetê lêkolînê xwand, anku (muxteberat) ,lê paşî wek sîstemê Holendî pêdivî bû navê min bêhête tumarkirin bo wê kolîjê demê tumarkirina nevî, navê min hat bo kolîja parêzeriyê û ez xwe dibînim miroveka bextewer ku ez wek jin vî karê pîroz dikim.

*** Aya kî dî ji vê malbatê helgirê bawernameka (diploma) bilinde wek te ?**

Em malbateka boşin, xûşka min a mezin helgira bawernama afseirya polîsiye, birayê min yê mezin helgirê bawernama parêzeriyê û paşî bawernama aboriya bilind bi dest xwe ve înaye, xûşka min a dî noşdar e, birayê min endaziyarê tekinîkê firokên helîkoptera ye û hejî gotinê ye ku ev birayê min hilgirê bawernameka (beraet alixtrae, simularor

for indoscopy), bira yê min yê dî hilgirê bawernama parêzeriyê ye û xûşka min hilgira bawernam aborye. birayê min yê ji hemûya biçûktir ew jî dê bite parêzer.

*** Çi we li we kir hûn hemû bibine xwedî bawernamên beriz û bi nirix ?**

Demê me dest bi xwandina xwe kirî, hindek gotinên dayk û babê xwe min li ber çavên kirin, ew jî (em li vir di xebitîn belko 20 katjimêra eger we divêt hûn wekî me bin karker anku dev xelkê kar bikin eve ya li ber destê hewe, eger we divêt hewlbden bo karê xamey û hizrê, ew jî rêk ji wera ya vekiriye li ber we) lewma me biriyar da ku em bibine helgirê bîr û bawernama û karê xamey bikin.

*** Aya hîç arêşe li bersînge te hebûn ku tu bi gehiye aremanca xwe an jî te hendek palder hebûn ku kar têkirin ser te kiribin ?**

Bêgoman eger arêşe heban, ne ez ne xûşk û birayên min nedigehştine vî astî. Belko malbata min palder bûn ew jî li vêre ez supasya arestey hemû xelkê mala xwe dikim ku palder bûn û her wesa supasî bo hemû malbata ku destê harîkariyê ji zaroyên xwe ra dirêj dikin û hewldidin ku zarokên wan serbexwe bin diboçûnên xwe de. Bêgoman eger em baş lê binêrîn nuke di demê karî da min û zor ji der bedera, anko xelkê biyanî li vêre arêşe hene li ser karî, çunkî ew hest dikin eve zoriye bû biyaniyekî li welatê wan bibite helgirê bawernameka bilind û dizanin ku em dê ji wan pêşkeftîtir bîn wek kurd, bo nimûne ez çome dadgehê min xwe daniyasîn ku parêzer bi şêweyekê fermî, dubare ji min pirsîn, tu kî min bo careka dî got ez parêzerim, paşî çend xelka got tu wergêrî, min gotê nexêr ez parêzerim, cara çarê pirsîn, erê tu kî? min got ez ya hatîm mafê hindek bêguneha diyarbikim, anko ez parêzerim, eve wek xelkekê normal nevêt bibînin em wek biyanî bûyne xwedî bawernamên baş.

*** Tu wek parêzerek tu hez di kî kîj corê pirobilema parêzeriyê lê bikey?**

Li cem min hîç cêwazyek nîne li nav bera corên pirobileman, bêgoman bo min zor xweştire eger mafê mirovekî hat bite xwarin û destê harîkariyê jêra dirêj bikim, çunkî ew karê serekî yê parêzerî ye. dubare min divêt hemû corên parêzeriyê li warê karê xwe da bikim û bi taybet min divêt mafê kurda çespînim û zor harî wan bikim. bo zanîn min divêt gotinekê bînime ziman, demê ez subê li xwe mêze dikim, min divêt bizanim ka min harî tawanbarekî nekiriye û min mafê êkê dî nexwariye, çunkî wî katî ez dê şehmizar mînim û dê şermê ji xwe kim, lê min divêt ez xwe bibînim ku min harî mirovekê çewsandî yê kirî û ez şiyay me mafê wî bidest ve bînim.

*** Aya Maşcela bi kê ya daxbare ?**

bi Nîlsin Mandîlay ya daxbarim çunkî yê gotî (dujmin dişêt hemû tişta li mirovî wergirît bes neşêt hizr u bîra ji mirovî werbigrit),û li nav miletê kurda ez ya babê netweya kurd Mela Mustefa Barzanî daxbarim çunkî ew wek serkirde û wek pêşmergeh kar dikir çi car xwe kêm neditiye, herdem li pêşiya pêşmergey dikeft û bo asteng bo dujiminî û milet parast ji hemû nexweşiyan, ez linav xelkê mala xwe yadaxbarim bi diyka xwe, çunkî ji-

neka ne xwandin û nevîsînê bizanit şiyaye li salên 73 roxseta şofêrpya holendî û şiyaye kar bikit bi awayekê serbixwe û vê daykê tovê serbexweya hizr û bîra li cem me çandî û peyda kirî, bi rastî eva nuke tu linik me dibînî ew berhemê hizra dayka mine.

*** Tu di şêy biye helgira dengê kurda, dê çewa gehîniye cîhanê ?**

Ez wek parêzer xwe dibînim li vir dê şêm dengê kurda û bîro boçûnên wan û êş û azarên wan hemûya gehînim, hewil bidim li gor şiyanên xwe mafê kurda bilind bikim, çunkî li vir mafê mirovî yê hey û bi zor rêk hene ku em dengê kurda bigehînin û mafê wan diyar û aşkira bikin, lê ta nuke min xwe nedîtiye ku ez bikarim karekê ramyarî (polîtîkî) bikim, ez dibînim bo min zor zûye.

*** Te çi pîlan hene eger bi zivîriye kurdistanê ?**

Eve xewna me hemûyaye eger êk car bigerîne kurdistanê û bi anehya xwedê ew roj ya nêzîk bûy, min pîlanek ya hey ew jî eger zivirîm ku bişêm hemû jinên kurdistanê ewên ne xwandevan, anko nezanin bi xwînin û binvîsin, firî xwandnê û nivîsînê bikim birêka vekirina fêrgehên taybet bo nehêlana jinên ne xwandevan.

*** Erê Maşelayê gotineka mezina ku her di hizira wêde bit heye ?**

Bê goman hemû gotinên mezina ez kar pêdikim û ez ya pê daxbarim anku yên hizrên min de belê ya ji hemûya pitir ez hizir pêtkim ew jî (bilind nefire eger dê nizim kevî).

*** Dumahyê te çi divêt bo jinên kurd li dervey welatî û li kurdistanê bêjî ?**

Ez hîvîdarm ku jinên kurd lidervey welatê xwe jibîr nekin ku kurdin, mafê xwe bi dirustî bi parêzin, hewl nede mafê kesekê dî bi çewsînin, bişaşî di mafê xwe ne gehin, kelturê kurdî jibîr nekin û hewlbden bine çirayekê geş ji bo welatê xwe, bo mala xwe û xwe jî jibîr nekin.

Sebaret bo jinên kurdistanê da dijîn her dê bêjm hîni helgira alayé şureşane, hînin dayku, xuşkên u xêzanên şehîda pêtvye hîn hewlbiden mafê rewayê xwe bidirostî bikar bihînin u malbatên xwe fêrken daku hizr u bîrên serbixwe hebin u da bine palderek bû hizru bîrên netweyî.

Bêgoman milet rizgar dibit eger her êkî hizrên xwe yên serbixwe hebin û zaroyên xwe ser hindê perwerde bikin.

Li dumahyê supasî bo te û dayka te ku we ev derfete dayeme..